

Stiftung gegen Gewalt an Frauen und Kindern

Vista

Fachstelle Opferhilfe bei sexueller
und häuslicher Gewalt

Vista

Yekîneya pispor ji bo alîkariya qurbanîyên tundiya
zayendî û navmalîyê



Agahî

Şîret

Alîkarî

kurdisch

Tesîrlêbûyî?

Gelo Hûn ji yek şêweyên jêrîn
ên tundiye bibandor bûne?

- » Tundiya navmalî
- » Gef
- » Destdirêjî
- » Bi zorê têxistina zarokan li
nav fihûşê
- » Gumana destdirêjiya zayendî
- » Tecawuz
- » Bi zorê têxistina hevala xwe
li nav fihûşê
- » Destdirêjiya zayendî, êrîşa
zayendî, bêhurmetî
- » Li kar destdirêjiya zayendî

Em rê nîşan didin û alîkarî dikin

- » Jin, zarok, kesên ciwan ên ku
rastî tundiya zayendî/navmalî
hatine, bê ku girîng be bê ka
ev tundî kengî çêbûye
- » »Kesên ku di derdora taybet
de ne: Hevkar, Xizm, Heval,
Kesên din ên têkildar
- » Pisporek ji saziyên din ên ku
bi pirsgerêka tundiya zayendî
û navmalî re mijûl dibin

Pêşniyara me

Em di rewşa we ya takekesiyê de ji we re rêyan nîşan didin û bi tevlêbûna we biryar didin gelo pêwistiya we bi alikariyêke çawa heye û hûn dikarin çawa mafên xwe bidest bixînin.

Em

- » ji we re şîretên derûniyê didin.
- » di derbarê maf û derfetan de li gorî Yasaya Alîkariya ji bo Qurbanîyan agahiyan didin.
- » di dema gumanbariyê de rê nîşan didin.
- » di mijarên civakî, yasayî û fînansiyê de alîkarî dikin.
- » ger pêwist be bi hawayekî lezgîn alîkariya fînansî peyda dikin.
- » We jî proseya zabitnameyên suçdari û hêlên erêni û neyêni li sebaretê rapora sucek de agahdar dikin.
- » di zabitnameyên dadgehan de we diparêzin, ger bê xwestin em di hevdfîtin û muzakereyan de tevlî we dibin.
- » di navbera we û pisporên wekî parêzer, terapîst û bijîşkan de navbeynkariyê dikin.
- » di danûstendinên navbera we û rayedaran an jî wezîfedarên din de em piştgiriyê didin we.
- » em girîngiyê didin parastin û ewlehiya zarokên we.
- » ji bo bi hawayekî lezgîn peyda kirina cihê mayîne alîkarî dikin.
- » di derbarê teklîfên koman de û kursên xweparastinê de agahiyan didin.

Hûn dikarin ji me alîkariyê bixwazin, ne girîng e ku dosyaya giliyê hatiye amadekirin an na an jî sûc di demekê berê de hatiye kirin.

Bila di bîra we de be: Dema ji bo tezmînetê û windakirina tezmînetê pênc sal e. Ji bo sûcên ku li derveyî welêt hatine kirin dê tu tezmînet an jî kefarete neyê dayîn. Ji bo zarokên ku di bin 16 salî de ne û kesên ku temenê wan 25 e lê hê jî bi malbatê ve girêdayî ne qaydeyêke taybet heye.

Vista navendeke alîkariya ji bo qurbanîyan e ku ji hêla kantona Bernê ve li gorî Yasaya Alîkariya ji bo Qurbanîyan hatiye pejirandin (OHG).

Navenda Vista ya şîretkariyê aîda Stiftung gegen Gewalt an Frauen und Kindern e).

Ji bo şîretkariya takekesî pêwistî bi qeydkirina telefonê heye. Em dikarin ji we re bi rêya online, bi tîlefon û bibênavî şewre bidin.

Xebatkarên me bi ewlehiyeke pispor ve girêdayî ne.

Pirsyarkirin belaş in. rawêjerî belaş.

Vista

Yekîneya pispor ji bo alîkariya qurbanîyên tundiya zayendî û navmaliyê

Bälliz 49 | 3600 Thun

T 033 225 05 60 | F 033 225 05 61

info@vista-thun.ch

www.vista-thun.ch



www.vista-thun.ch



Cihê me

